

Dr.Nûredîn Zaza
1919 - 1988

# NEW ROZ



Osman Sebrî
1905 - 1993

*Xebat ji bo* :
* Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd ên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de.

*Ji weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê*

Hejmar ( 131) | Sal 22 | Pûşber 2017 z - 2629 k | Êmêl : Newroz@yek-dem.com | Buha (75)L.S


## Yekemîn Partiya Kurdî Li Sûryê ... Di bîranîna Şêstemîn De

**Memê Alan**



Li 14.6.2017z-2629k rêxistina Efrînê ya Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê seredana gorên van pêşengên me yên pêşîn kir: Şewket Ne`san li gundê Tilifê, Reşîd Hemo li gundê Hopka û Mihemed Bekir li gundê Çeqela. Piştre, bi beşdariya girseyek cemawerî ji heval, dost û welatiyên deverê, ahengek li ser yarîgeha bajeroka Reco hate lidarxistin. Pirograma ahengê bi vê awayî bi rêve çû: …. ❸


## ÊVARA XAPANDINÊ



**Emel Etî**

Kobanê ne tirs û ne jî tiştên wiha dizanî. Em tev de zarokên vî bajarê di dîrokê de jibîrkirî ne; lê em ser bilid in bi dîroka xwe ya zêrîn. Em li destana Baqî Xido, Derwîşê Evdî û ……… ……………… ❹

## Dr. Emîr Hesen Pûr Çû Ser Qedera Xwe



Li roja 24/6 2017an, nivîskar û ramiyarê Kurd Dr. Emîr Hesen Pûr li nexweşxaneke bajarê Torênto - Keneda temenê xwe kir û çû ser qedera xwe.

Emîr Hesen Pûr li sala 1943an li bajarê Mihabadê li Rohilta Kurdistanê ji dayîk bû bû. Li sal 1964an fêrnama Bekeloryos di zimanê Înglîzî de ji zanîngeha Tehranê wergirti bû. Li sal 1989an jî fêrnama Mastir (macistêr) di mijara "zanîna zimên a civakî û dîroka Rohilata Navîn" de ji zanîngeha Êlînoy a Emerîkî wergirtiye. ………... ❹

# Rapirsîn Li Herêma Kurdistanê

**M.Duderî**

Li despêka miha Pûşberê, Rêzdar Mesûd Barzanî serokê Herêma Kurdistanê (HK) civînek li gel partiyên Herêmê li dar xist û biryarên giring tê de standin.

Ji bilî biryara hilbijartinên serokê Herêmê û parlemana Kurdistanê ku dê li 6/11/2017an li dar bikevin; biryara rapirsîna ji bo naskirina dilxwaziya gelê Herêma Kurdistanê di serxwebûnê de jî hate standin. Rapirsîn wê di 25ê miha Rezberê (Êlûnê) de li dar bikeve.

Tiştê ku ciyê dilxwaşî û vehesiya xelkê ye, hemî partî, sazî û dezgehên sîvîl û xelkê HK li ser pirsa lidarxistina rapirsînê erê dikin, bûye cihê kêfxwaşiyê û wek mafekî bingehîn û rewa dibînin.

Li beşên kurdistanê ên din jî nêrîn û helwestên erênî ji hêla partî, hêzên siyasî û saziyên sivîl derketin û hîn derkevin. Ew hemî rapirsîn rast û rewa dibînin û pişgiriya xwe jê re xuya dikin.

Ango gelê Kurdistan, bi hemî pêkhateyên xwe, bi çoşeke balkêş li kêleka biryara rapirsînê disekine û wê pesend dike. Ji ber ku rapirsîn şêweyekî rast û rewa ye di sîstema bidestxistina mafên siyasî ên demokrat de. Ew li gora rêzan û zagonên navnetewî û navdewletî ye jî. Di van sê dehsalên dawîn de, bi dehan miletên cîhanê mafa rapirsînê bi kar anîne, rewşa xwe ya siyasî guhertine çarenû kirine, di encaman de dewletine serbixwe jî hatine avakirin û lêmikurhatina navdewletî wergirtine, ji komarên Yekîtiya Sovyêtê de bigire û ta bigihê Başûrê Sûdanê.

Lê di gel helwestên gelêrî û sivîlane ên erênî, helwestên rayedarên hin dewletên herêmê û derveyî herêmê jî di tenga rapirsînê re mijokî û ne erênî ne; hinek jê li dijî rapirsînê derdikevin, di serî de jî dewletên ku welatê kurdan di nav xwe de parve kirine. Her çar dewletên ku Kurdistan di nav de hatiye parvekirine li ser helwesta xwe ya dîrokî dimînin, li pêş azadiya gelê Kurd disekinin, dibin asteng û dijber jî. Erê ew jî mîna hin dewletên mezin doza “parastina yekbûna xaka dewleta Îraqê” dikin; lê ew wê helwestê tenê wek behane bi kar tînin. Çinkî ji bingehê de pirsa hebûn û nebûna Îraqê û yekbûna wê ji wan re giring e; pirsa wan a sereke tirsa ji serxwebûna gelê kurd û beşekî ji Kurdistanê ye. Tirsa wan a bingehîn ku dor were ser wan jî, û doza mafê gelê Kurd li her derekê bi ser bikeve.

Lê bi saya têkoşîna gelê Kurd a deh salan, xebata wî ya gewre ji bo parastina hebûn û mafên xwe ên rewa, têkoşîn û rola wî ya erênî li dijî têrorê, hîştin ku hemî gelên cîhanê



rastiya hebûna gelê Kurd, rastiya rewşa wî ya mafdar, zulm û zordariya dîrokê ku dîtine, nas bikin, rewa bibînin û piştgiriya wê bikin. Lewre jî, roja îro li seranserî cîhanê, helwest û zemîneke siyasî ye xurt ji bo pişgiriya gelê kurd afiriye û roj bi roj hebûna dewleteke serbixwe wek mafekî rewa hatiye pejrandin.

Lê rayedarên Herêma Kurdistanê baş tê digihên, ku pirsa kurdî li Kurdistana Îraqê bi du aliyan ve girêdayî ye; yek, Bexdad e, a din jî helwesta Yekîtiya Netewan û Encûmena Ewlehî a Navnetewî ye. Loma jî ew seredanan ji Bexdadê kêm nakin. Ew bi du xala pêbend in;

Yek: Goftûgo bi Bedadê re, çinkî ew tekûz dikin û dibêjin, gerek e pirojeya serxwebûnê û pêkanîna wê bi şêweyên aştiyane û bi lihevkirina bi Bexdadê re pêk were;

Xala din jî: Erêkirna saziyên navdewletî û di serî de Encûmena Ewlehî ya Navdewletî ye.

Kurd ne kurdên sala 1925an e. Eger rapirsîna wîleyeta Mûsilê a xapînok ya wê demê kurd xapandin û serxwebûna wan sed salî bi şûn xist, lê rapirsîn 25ê pêşberê wê dengên gelê Kurdistanê ê rast û durust ji dewlet, raya cîhanî û ji Yekîtiya Netewan re jî bide naskirin.

Partiya Yekîtiya Demokrat a Kurd li Sûryê dibîne ku pişgiriya rapirsînê erkekî netewî û niştmanperwerî ye. Lê dibîne jî ku rapirsîn û ragihandina serxwebûnê bi xelkê Herêma Kurdistanê û rayedarên wî ve girêdayî ye. Çinkî ew ji kurdên Sûryê baştir rewşa xwe dizanin û nas dikin. Serxwebûna Kurdistanê xewna her kurdekî ye. Lê em zanin jî ku rapirsîn ne serxewbûne, ji hev cuda ne. Rapirsîn gavek e li ser rêyeke dirêj ji xebat, goftûgo, têkildariyê siyasî bi hemî dewletên herêmî û cîhanî re. Lê gerek e dost û dijmin jî zani bin, ku biryara dawîn ne li Enqerê, Tehranê û Şamê, ew li Hewlêr û Bexdadê ye.

**Yekemîn Partiya ... Dûmahîk**



- Kêlîkek bêdeng li ser giyanên pakrewanên Kurd û Kurdistanê û her heft sazkirên partiya yekemîn di gel sirûda Ey Reqîb hate rawestandin.

- Gotin û birûsk hatin pêşkêşkirin: Gotina Tev-Dem, Partiya Yekîtiya Demokrat(pyd), Partiya ya Komonîst Yekbûyî a Sûrî, birûskek ji Saziya Fêrkirin û Parastina Zimanê Kurdî û ji Komela Rewşen Bedirxan a Jina Kurd.

- Kurtejiyanên çend damezrênerên partî û ya Dr. Nûridîn Zaza jî hatin pêşkêşkirin.

- Hejmarek ji xebatkarên nofên pêşîn li ser şanogehê hatin pêşwazîkirin.

- Hunermendên rêzdar Hikmet Cemîl û Isma`îl Mihemed, li gel komên folklorî (Zozan û Şêrzad) bi stiran, dîlan û semayên xwe yên xweşik festîval xemilandin û dilê beşdaran xweş kirin.

- Sekretêrê P.Y.D.K.S Mihyedîn Şêx Allî gotinek kir, tê de bi ferehî û bi zimanekî zelal li ser rewşa Sûriyê û rewşa gelê Kurd sekinî û helwesta partiya PYDKs ravekir. Bi kurtî, xalên sereke ji gotina rêzdar Şêx.Allî ev bûn:

Li despêkê silav li her heft damezrêneran, Reşîd Hemo, Şewket Ne`san, Mihemed Elî Xoce, Hemze Niwêran, Hemîd hec Derwîş, Osman Sebrî û Dr.Xelîl Mihemed kir, rêz û rûmeta wan û karûbarên wan giranbuha nirxand.

Di warê sedemên qeyrana Sûryê de, wî tekeze kir ku rijêmên destlatdar, bi taybetî rijîma El-be`is li Sûriyê û Îraqê siyasetek qirêj û şoven di dermafê tunekirina hebûn, ziman û kultûra gelê Kurd de dajotin. Rijîma Sûriyê ta niha jî di wê siyasetê de berdewam e. Armanca wan ew e, ku mafê rewa yê gelê me di destûra Sûriyê yê pêşerojê de cî negire û lê mikûr netê; lê tevgera kurdî serûber kanî bû li hember wê ton siyaseta tund li ber xwe bida û hebûn, ziman û taybetmendiya gelê Kurd ji wendabûnê biparasta. Şêx Allî got, tevgera me ji roja roj de, di karanîna têrma demokrasiyê de pêşeng bû. Hemî partiyên tevgera siyasî ya kurdî ne perçexwazên Sûriyê ne; ew cudahiyên olî, bineolî û netewî nefret dike.

Hevalê sekretêr mêlag kir û got: Bi Kurmanciya zelal, partiya P.Y.D partiyeke kurdî ye bira ye û ne teror e, weke ku hinek dixwazin wî navî bi ser xînin. Ji bo danasîna sedema qeyrana Sûryê jî, bi zelalî got, ku sûcdarê yekê di ber qeyrana Sûriyê de rijêm e; Tevgera Ixwan El-mislimîn û çêlikên wê (Girûpên çekdar ên islamewî, Da`iş, Nesra) û piştgirên wan jî, dema ku berê xelkê dane biçekaranîna serhildêran, qeyrana Sûriyê aloztir kirin, xizmet armanca rijîmê kirin û daxwaza wê anîn cî. Ji bo wê yekê, partiya Yekîtî ji roja yekê de got: Stop û na ji çekdarkirinê re, lê belê em neçar bûn ku em gel û herêmên xwe biparêz in.

Li derbara helwest û pêlanên dewleta Tirkiyê jî, Rêzdar Allî got, ku ji destpêka kirîza Sûriyê de, me wek P.Y.D.K.s. gelê xwe haydar kir, ku bila em bi pêlanên Turkiyê neyêne xapandin, me ji hemî alî û encûmenan re jî diyar kir, ku divê em serborî(îbret) ji berevaniya Y.P.G û Y.P.J li devera Qestelê Elî Cindo û Serê Kaniyê wergirin, em ji wan re alîkar û piştgir bûn jî. Me herdem digot, ger em ji Efrîn, Kobanê û Cezîrê hez nekin, em nikanin Ji Mihabad, Hewlêr û Amedê hez bikin. Herweha ger em ji Y.P.G û Y.P.J jî hez nekin, em nikanin ji Pêşmergan jî hez bikin, û tenê wê hîngê em derewan dikin.

Li derbara siyaset û kiryarên dewleta Îranê jî wiha axivî: Rast e ku Îran bi me re ne cîran e, lê ne Misir, Si`ûdiya û Urdin Qadî Mihemed bi darvekirin, dezgeh û zihniyeta rêbaza Ayetulah Xilxalî ew kara kir. Îran bû ya ku li sala 1968an Sekretêrê P.D.K.Î Silêman Me`înî (Tewfîq Emîn) kuşt, bi paş makînê ve girêdayî û li kolanan xuşand; ew bû ya ku li Viyêna Dr. Qasimlo û li Berlînê Sadiq Şerefkendî kuşt.

Sebaret PKK û rêberê wê rêzdar E.Ocelan jî wiha axivî û got: Teqîn û piroseyên teror ku li Turkiyê çêbûn, Da`işê kirin ne PKKê wekî ku raghandina bi ser Turkiyê ve dixwaze xuya bike. Birêz Ebdela Ocelan ne tewankar e, ew siyasetmedarekî navdar û nûnertiya beşekî mezin ji gelê Kurd dike. Vêca çima Rijîma Turkiyê tecrîdê ji ser ranake? Em bawer in rakirina tecrîdê ji ser Ocelan, wê bibe kilîta aştiyê û vekirina diyalogê di navbera dewletê û Kurdan de.

Sebaret babeta rapirsîna ji bo serxwebûna Herêma Kurdistana Îraqê jî Şêx Allî dupat kir û got, ku ew biryareke rewa ye û ji mafê gelê Kurd de; erê ne ji mafê beşên dine ku dengên xwe bidin, lê em jê re alîkar û piştgir in. got jî, gelê me yê Kurd tucarî êrişî tu aliyan nekiriye, lê ew herdem hatiye êrişkirin.

Li hember van êrişan, xebateke bê hempa û rawestandin gerek e; ajotina şopa wan nemirên damenezrêner û xwendina berhemên wan pêwîst e. Çimkî zanist û zanîn dermanê her derdekî û bingeha her serkeftinê ye. Çandin û parastina darûberan parastina Kurdistanê ye. Lihevkirin û yekrêziya me Kurdan jî kilît e û zor pêwîst e ku rojekê pêşde pêk were.

***Têbîn: Win kanin li ser vê girêdanê guhdarî bikin: www.yek-dem.com.***

# Tevlêbûna civakî (Integration)

**Dr.Muhamed Zeyno**

Di van çend salên dawî de, gelek gengeşe û axaftin li ser Tevlêbûna civakî li dewleta Aleman dibe. Di rastiyê de, ew tevlêbûn bernama hikumeta misteşara Almanya xanim Angela Merkel e . Ev bername ji bo penaberan hatiye dirust kirin. Diyar e di van pênc salên dawî de, bi hezaran mirov gihane vî welatî. Helbet desthilata Almanya wê xwe bi wan re mijûl bike û li paşeroja penaberan miqate be. Hin ji penaberan dibêjin dêmek Alman dixwezin me di nav civaka xwe de bibihurînin; tewir hinek ji me dûrtir çûn û gotin Alman dixwezin "zarokên me bidizin". Di rastiyê ev bernama hikumetê di berjewendiyên me de ye . Helbet li Almanya, wek li her welatekî din, xirabî, nerindiyê û tewan hene, kujer, diz û xwendin jî heye. Li vir bi hezaran tîştên baş û bedew û ciwan hene.

Dema mirov li derûdora xwe mêze dike, li paqijî, dûzan û tertîbê dinêre, divê zanibe ku ev hemû bi kar û cefa hatiye ava kirin. Lewra pêwîst e mirov bi zûtirîn dem karekî ji xwe re peyda bike û xwe ji alîkariya dezgehên alîkariyê rizgar bike. Kar rûmetê dide mirovan. Dema ku mirov ne ker, kor, lal û seqet be, gerek e kar bike. Her weha bi qusandin û ziravkirina birhan, pantelonên paşdirî, dirêjkirina rihan, vexwerina bîra, vodka û qîreqîra li kolanan tu naşebihî mirovên van




welatan. Bazdana li dûv diyardeyên neyênî te dînane ser riya rast ya tevlêbûna civakî. Ticarî li kolan, dukan û sûkan li zarokan medin û bi ser wan de mekin qêrîn. Zarok li van welatan pîroz in û di bin çavdêriya civakê de ne. Gelek caran me dîtiye bê çawa karmendên dewletê hatine malên penaberan û doza rewşa zarokan li wan dikin. Li vir yasa gelek sert e, çi ji bo xelkê xwe û çi ji bo penaberan. Dewleta Almanya her derfetê dide mirovan ta ku karekî ji xwe re peyda bike. Li vir bi sedan dibîstanên jinûvafêrkirina mirov vekirine. Ew derfeteke baş e ji bo tevlêbûnê peyda dikin. Pêwîst e em sûdê jê wergirin, pîşeyekê bi dest xwe bixin, têkevin nav kar û civakê û ji bo xwe û wê kar û xebatê bikin. Bila em berhemdar û sûdar bin, ne lomekar û têkbir(Misthlêk) bin.

**ÊVARA …. Dûmahîk**

perwerde bûne. Di destpêka bûyerên Sûrî de parçêmikên şevê dest bi kontrolkirina darûberan kirin. Nehştin çûk û kevok hêlînên xwe ava bikin . Di vir de jî dest bi xapandinê dibe.........

Piştî şer, pevçûn, koçberî, wêrankirin û êrîşên ku çeteyan li ser Kobanê kirin, û piştî rizgar kirina vî bajarî, xelk vegeriyan welatê xwe bi dilê şah û rûyê li ken, lê vê kêfxweşiyê bi wan re nedomand . Di 25/6/2015an de, di şeveke wekî her şevan de, hênkayî sekinî û germahiyê dest pê kir. Di wê şevê de sivîlên Kobanê bûn paşîva rojiyê. Zarokên Umir û Abû Bekir leşgerên xwe şanadin nava bajêr û gundê Bexbatan ê girêdayî herêma Kobanê, wan di bin navê îslamê de, di destekî de şûr û di destê din de jî pirtûka pîroz (Qur'an), jin, zarok û temen dirêj teror kirin. Lehiya xwînê di nava kolanan de herikî, bi sedan parçêmikên şevê bê dilovanî serê xelkê Kobanê jêkirin. Ev êvar di dîroka Kobanê de bû sembolek, di wijdana gelê wê de hat kolan û di kolanên bajêr de hat binaxkirin ji bo ku neyê ji bîr kirin. Hezar dilovanî li giyanê pakrewanan be Bimre çeteyên hêzên teror û hov.

**Dr. Emîr … Dûmahîk**

Piştre çû bû welatê Keneda û li zanîngehên bajarên Montiryal û Torênto mamostetî kiriye.

Dr. Emîr Hesen Pûr nivîskar û ramyarekî çepgir dihat dîtin. Gelek pirtûk û lêkolînên wî di warên raman, ziman û civaka kurdî de hene. Ew ji nivîskar û ramyrên kurd ên gewre tê jimartin. Ji pirtûk û berhemên wî bi zimanên îngilîzî û kurdî:

- Netwetî û Giyana Netewî - bi zimanê înglîzî. - Deng û Wêneya Jinê di Hunera Devkî de. - Wêjeya Devkî li Mokriyanê. - Zimanê Kurdî yê Yegirtî. - Ferhenga Devkî û h.d. gelek lêkolînên ramanî, nivîsarên di babetin din de jî hene û Pê pirtûkxana kurdî dewlementir Bûye.

Hêjayî gotinê ye, ku jina Dr. Emîr, Xanim Şehrezad Micab ji netewa Faris e, ew jî li zanîngeha Torênto mamoste ye; Xanim Şehrezad bi kurdî baş zane, di warên zimên û çandê de lêkolîner e jî.

Bi goçkirina nemir Dr. Emîr Hesen Pûr, stêrkeke geş ji ezmanê çand, ziman û kelepûra kurdî rijî. Mirina wî, ziyaneke giran bû ji çand, civaka kurdî û ji gelê Kurd re.

Bi navê xwendevan û nivîskar weşana me Newroz, em serê malbata nemir Emîr Hesen Pûr û hemî gelê Kurd xweş dikin.

# Roja Cihanî Ya Xebata li Dijî karê Zarokan

**M.Elî**

Li sala 2008an, Rêxistina Yekîtiya Netewan roja 12 Pûşberê wek "Roja Xebata li Dijî Karkirina Zarokan" bi nav kir. Ew roja ji bona belavkirina zanînê di warê karkirina zarokan de, nemaze di nav qadên sêfîl de were bibîranîn.

Li gora pîvanê "Rêxistina Kar a Navdewletî" ku li sala 1919an hatiye damezrandin, zarokê ku temenê wî kêmî panzde salî be, xwendina xwe ya sertayî kuta ne kiri be, yan jî derfeta xwendinê ji dest çû be û daketi be nav karkirinê, ew ji zarokên karkir tê jmartin.

Li gora zagonên navdewletî, karên ku ji bo zarokan qedexe ne, parve sê beşan dibin; Yek: Kirîn û firotina mirov û bikaranîna wan di hêla cinsî de, karên zorane, bikaranîna wan di nakokiyên çekdarî de û hd. Didu: Karê ku di ser kanîna govde û temenê zarok re be, ji bo bidestxistina xwendinê asteng be û ji bo mezinbûna govdeyê wî jî ziyandar be. Sisê: Karê ku li ser tundurustiya wî a govdeyî, ramanî û derûnî



ziyandar be, çi ji ber cureya kar, çi ji ber nîrên ku tê de kar dikin, ango "karên buveh û metisîdar".

Li gor rêxistina Unîsêfê, li seranserî cihanê dora 159 milyon zarokên ku temenê wan di bin panzde saliyê re ye û daketine nav kar, hene. Wan zarokan xwendina xwe kuta ne kirine, derfeta xwendinê ji dest çûne û ji nexwendeyan tê jmartin.

Li Sûryê jî, li gora serhejmarên pêbawer, dora 45% ji zarokkên Sûryê ji dibistanan durketine, derfeta bidestxistina xwendina seretayî ji dest çûne û piraniya wan daketine warên kar. Civaka kurdî li Sûryê, wekî ku beşek e ji civata sûrî, rewşên ku Sûryê tê re derbas dibe ew jî tûşê dibe; ew rêje û serhejmara ji bo civaka kurdî jî rast e. Ango tiştê ku bi serê civaka sûrî hatiye, bi serê civaka kurdî jî hatiye û ew ji ber dinale.

Dûrketina zarokan ji xwendinê û daketina wan a nav kar, pirseke girîng e û buveh e. Ji ber ku piraniya zarokên dikevin nav kar, hêviya ku xwendina xwe kuta bikin tê birîn, nexwende dimînin, asta nezaniyê bilind dibe, barekî giran dikeve ser milê civakê, destlatan û paşeroj û pêşdeçûna wan. Ew civaka ne kane sûdê ji pêşdeçûnên şaristaniyê bibîne û ne bi xwe xwe pêşde bide; ji bilî ku gelek nexweşiyên civakî, sinciyane û reftarî jî ku ji nezaniyê tên, weke vexwarina cixarê, birina hişbirê, şimtandinê sinciyane, û gelek titên ne rind li nava civakê belav dibin.

Li Sûryê bi giştî, sedemên ku zarok ji xwendinê dûr ketine û dadiketine warê karkirinê gelek in, jê: Wêrankirina şêngeh û dibistanan, xizanî , mişextbûn, şerê dijwar û h.d.. Mirina hejmareke mezin ji malxuyên malan jî dihêle ku zarok xwendina xwe berde, bibe berpirsiyarê malbatê û dakeve warê kar. Mixabin! Nbêrevaniya dewletê û destlatên ku destlatdar in jî di warê parastina zarok û zaroktiyê de ne maye, li bervajî wê, gelek hêzên çekdar û aliyên keftleftê zarokan dikin bi çekan û weke şervan bi kar tînin.

Bi rastî, li civaka sûrî, kurdî jî di nav de, babeta karkirina zarokan bi şêweyê pir xirab tê ber çavan. Tukes guhdanê pê nake û xema wê naxwe. Pir giring e, ku Xwseriya ku li herêmên kurdî destlatdar e guh bide pirsa zarokên karker, wan ji êşek, nezanî, nexweşiyên govdeyî û derûnî, perwerdeya xirab û her tiştê ku nifşê nû û paşeroja me pê wêran dibe biparêzin, rewşa dibistanan baş bike, guh bide mal û malbatên xizan, li ser kergeh û karxaneyên ku zarokan bi kar tînin bigerin, wan nexin bi çekan û eniyên şer û rewşa wan bişopînin. Gerek e em zarokê xwe nexin devê guran û li mala xwe rûnin û lingan di ser hev re bavêjin. Berpirsiyara mezinkirin, xwendin û perwerdekirina zarokan, pirsek tevahî ye, dê, bav, malbat û hemî sazî û dezgehên destlatê di ber de berpirsiyar in, gerek e ew jî bi dilsozî erk û stubariyên xwe bi cih wînin û ji ber nerevin.

# Kelepûr: Kurtanê Kerê

**M.Bilo**

Tê gotin, ku rojekê dawetek li gundekî Çiyayê Kurmênc li dar diket. Wê hîngê xandî (mêvanên zêve) dihatin û dawet şên dikirin, dawetê jî bi rojan dirêj dikir. Gava şev dahat, roja yekê ji dawetê bidawî û xandî li malên gund belav bûn. Lê tenê ciwanmêrekî jî ji xwe xweş bê cih ma! Xudanên dawetê nîvê malên gund dan hev lê ti cî ji mîvên re ne dîtin. Li dawiyê raste pîrejinekê hatin, wî jê re got:

- Xaltîk ez bê cî mame! Ma cî li mala te heye ku lê razêm?!

- Bi Xwedê kurê min cih neman, bes tiştek maye, lê ez fedî dikim ji te re bêjim!

- Na na xaltîk tişt nabe bêje!

- kurtanê kera me li dera hana ye, heger tu dixwazî here li ser raze!!

- Wey xaltîk tu kurtên liyaq min dibînî?!

Ciwanmêrê pozbilind xeyidî, careke din dest bi gerê kir û got: Hîn nîvê gund maye, ezê îlem cihekî bi dest bixim. Wî mal bi malên gund ên mabûn dane hev lê tu cih nedît, di ber xwe de got: Ka ez vegerim ba pîrê!



- Xaltîk, ew tiştê te got li kû ye ?!

- Kurê min, bi Xwedê berî tu werî, kirîf hatin û li ser kurtên xwekirin!!...

# Hin Baweriyên Gelêrî



**Nazdar Hesen**

Her miletek xwedî hizir û ramanên taybet e, lê belê bê ku bingeha rastiya gelek ji wan nas bike an jî vekolîne pê bawer dike. Carina ew bawerî bi sedsalan dimînin, ne tên ji bîr kirin û ji nifşekî radestî nifşekî din dibe, ta ew bawerî û bîrokên ramyarî bi demê re dibin beşek ji çanda wî miletî, û li cem nofeke ji xelkê dibe cihê vehesiyê, û jêderek ji bo ku geşbînî an jî reşbînî diyar bike. Ji ber vê yekê, gelê me yê Kurd jî weke gelên din, baweriyên xwe yên taybet hene, çi di warê jiyan û mirinê de, an di xweşî û nexweşiyê de û h.d. Ji van baweriyan weke ku dihat bawerkirin, her mirovek, stêrkeke wî li esmên heye, dema stêrkek tê xwar, yanê jiyana mirovekî bi dawî dibe. Di çarşeman de serê xwe û zarokên xwe nedişuştin, digotin ên ku xwe di vê rojê de dişon belak bi ser wan de tê; gava tiştên malê weke camê dişkên jî, dibêjin xêr e, di ber qeda û belayê de ye. Ger kesek di ser zarokekî biçuk re gav bike, wê bihêle ku temenê wî zarokî kurt be. Ji bo hin baweriyan, nivişt li cem şêx û meleyan çêdikirin û bi xwe ve dixistin, ev nivişt ji bo gelek armanc dihat çêkirin çi ji bo tirs û nexweşiyê, çi ji bo vekirina miraz û bextan û h.d., eger lê bihata û ew daxwaza pêk bihata, her diçû baweriyên xwe pirtir pê dikirin.

Erê, ta niha ev bawerî li cem hinan hene û pê bawer dibin, lê belê di vê derbarê de, em dikarin bêjin ku pir tişt hene hikariyê li ser mirov dike ta dihêle xwe radestî van baweriyan bike. Ji van tiştan: Jîngeha mirov ya ku tê de dijî, bandoriya kevneşopiyên dêrîn, hişên girtî û dûrî zanînê; ji ber vê jî gerek e hêdî hêdî em xwe ji van baweriyên paşdemayî û şaşiyên ku ji sedsalan de mane rizgar bikin û em jî nebin sedem ji bo belavkirina wan.

# Zimanê Kurdî û Ewrûpa

**Seyfedîn Dabo**




Piştî ku şerê navxweyî li Sûriyê û Rojhilata Navîn gur bû, bayê penaberiyê rabû û hejmareke mezin ji Kurdan weke miletên din berê xwe dane Ewrûpa û Rojava û li gelek welatan belav bûn. Bê guman, nifşên ciwan û zarok bêhtir dikanibûn bi nişticiyên wan welatan re têkildar bibin, çi li dibistanan, çi li dîdar û avjenîngeh û cihên din jî. Ji ber wê jî ew zû fêrî çand û zimanên wan miletan dibin, pê dinivîsînin, diaxafin, dixwînin û di pir waran de jiyana xwe weke wan derbas dikin. Lê di warê fêrbûn û parastina zimanê zikmakiyê de, ango zimanê Kurdî, ew roj li pey rojê lawaz dibin û zimên ji bîr dikin. Çimkî ne tenê li derveyî mal pê naxifin, di hundir mal de jî bi hev re bi zimanên biyaniyan şorê dikin. Her wiha mûzîk stranên wan jî dibhîsin. Tevî ku li Almaniya, welatê ku piraniya Kurdan lê bi cih bûne, ji sala 1994an de, wek perleman û şalyara perwerdeyê, biryar daye ku li her dibistanekê heger şagirtên Kurd hebin û bixwazin bi zimanê xwe yê netewî bixwînin, divê mamoste ji wan re peyda bibin û weke zimanê Almanî bi rengekî fermî bête xwendin.

Her çendî malper û rûpelên Internenî yên taybet jî bi zimên Kurdî hene, lê xwedanên zarokan guh nedan vê mijarê û zimanê xwe paşguh kirine. Zimanê zikmakiyê yan jî nasname û hebûna wan li Ewrupa di bin gefa jibîrkirin û wendabûnê de ye . Hêja ye ku mirov bêje, Kurdên kevin yên li van welatan dijin û helbestvan û nivîskar jî di derbara hînkirina zimên de tu gavên erênî ne avêtine. Nivîskaran tim hewil dane bi zimanên din, weke Erebî, Farisî û Tirkî binivîse. Ji ber ku ji aliyekî ve xwendevanên Kurdî kêm in, ji aliyê din ve jî sûda wan a diravî tê de tuneye. Em hêvî û daxwaz dikin, ku xwedanên zarokan di malên xwe de jiyana xwe bi Kurdî biborînin û bi wan re bi zimanê wan yê zikmakî baxifin. Her wiha wêjevan û rêxistinên ramyarî jî di derbara vê babtê de bi erkê xwe rabin, zimên bidin parastin, xwendin û hokirin .

# Mirûdên AKPê jî Mîna DA`IŞê Peykeran Dişkînin!

**Rozad Elî**

Bajarê Bazîdê bajarekî li Bakurê Kurditanê li ber Çiyayê Agirî ye. Ew bajarê mîrê helbesta kurdî û afrandeyê destana Mem û Zînê Ehmedê Xanî ye û li wir jidayîk bûye. Di hillbijartên şaredariyan de, berendamê Partiy Gelên Demokrat bi ser ket û bo serokê şaredariya bajarê Bazîdê. Piştî ku dewleta AKP ew girt û xiste zîndanê, endamekî ji Partiya Dad û Geşebêdanê AKP kire serokê şaredariya bajarê Bazîdê. Li roja bîst û şeşê miha Pûşberê, li ser biryara serokê şaredariyê ê AKPeyî, peykerê mîrê helbesta kurdî EHMEDÊ XANÎ ku li nav bajêr hati bû venandin, hat şikandin û rakirin. Li gelek bajar û deverên Kurdistanê ên din jî karê wiha çepel û ne rewa hatin kirin, peykerên navdarên Kurdan hatin rûxandin û ji meydanan hatin rakirin, nav û nivîsên kurdî yên gund û kolanan jî ji ser tablo û çaterêyan têne rakirin û ên tirkirî vedigerînin.



Kurd dibêjin "gur eyarê xwe navêje", herwiha tirkên nijadperest û toranî jî eyarê xwe navêjin û ne dê bavêjin. Çiqas cilên xwe ên şovenîst biguhêrin, kirasên olî û olbawriya mislimantiyê bi ser xwe de berdin, xwe cîlaw bikin, bi demokrasî û mafên mirovan ban bikin, ew dimînin mirovine zikreş, destlatdarine nijadperest, ji dîroka xwe ya osmanî a reş û nezan re dilsoz dimînin û dev jê bernadin. Ji ber ku pirsa bajarvanî û demokrasiyê ne bi guhertina şaşikê bi şibqê ye, ne jî bi guhertina nav, duruşm û qêrîna Erdoxan a bilind bi navê biratî û wekheviyê ye. Pirs pirsa guhertina binê şebqê, guhertina hiş, bal, raman, hizir û mêjî ye. Pirs pirsa lêmikûrhatina li hebûn bêtirî 15/milyon Kurd û mafê wan ê rewa li ser xaka welatê xwe ye; pirsa dagîrkerî, nijadperestî, qelaşî û helwesta dîrokî ya (toranîstên) AKP, MHP û alîgirên wan e. Çiqas were gotin ku Tirkiye bûye dewleteke medenî, demokrasî û xwedî zagonên şaristanî, lê kavilkirina peykerê helbestvanekî ku ji bêtirî sê sed sal de miriye zikreşî wan xuya dike. Xuya dike jî, eger berê ew tenê nijadperest bûn, lê niha firka olperstiya lişûnmayî ketiye ser û lê zêde bûyek, çûne ser şopa daişiyan û peykerên (gawiran) dirûxîne.

Kurd berê ji ber de tûşî regezperestî û toranistiyê dibûn û ji ber dinalîn, lê niha Ixwantiya kevneperest ya AKP jî lê zêde bûye. Destlatdariya AKP û hevalkarê wê MHP bûye mîna peryên bi du rûyan, rûyek toranîst û yek Îxwanîsteke bi rengê da`iş e. Ev her du rêgez jî tu siyaset û dewletên demokratîk û nûjen ava nakin. Azadî,aştî û biratiya gelan ne ji têgehên wan in û mafên gelan nas nakin. Kurd dibêjin "heft salan dûvê kûşkê kirin qêlib, lê hîn firkek lê zêde bû", Erdoxan û mirûdên wî jî pişt panzde salan ji destlatdariyê hîn çend firkên kevneşop û nijadperest li hiş û siyaseta wan zêde bû.

Lê belê, roj bi roj xewnên wan ên Osmanî pûç dibin, pêlanên wan ber davêjin û têk diçin, siyasetên xwe tazî dibin, ew wek mirovekî gurî dibe, herkes xwe jê diparêze, ixwantiya wî baştir tê naskirin, bi tena xwe dimîne û xwenên xwe ên kovfkî, pûç û riziyayî wî dixapînin. Eger Erdoxan û mirûdên wî ne wilo biwana, ma serê xwe dikire peykerî mîna yê Ehmedê Xanî ku şanek e ji şanên wêje, helbest, kelepûr û mirovatiyê ye!?. Lê belê, eger rojekê ewr reş bûn û roj di paş de ma, ne tê wê wateyê ku ewê herdem wilo bimîne û zalim wê bidin cirîtê! Lê wekî ku xuya dibe, cirîta AKP û serokê wê ne cirîta serkeftinê, ew cirîta berî têkçûnê ye.

# Zîndana Rojê

**Sêvîn Edhem Xelîl**

Di tariya şevê de, dengê şipşipa baranê li têlên guhê min dixîne.. Dem derbas dibe û dunya mîna zîndanek tarî dibe. Dilê min tê givaştin, sed hezar gotin li deriya mejiyê min dixe û di hundirê xeyalê min de xwedî cih dibin.. Birayê min..!! Tê ber çavên min û nişkave winda dibe, ji nişkava li ber çavên min mîna teyrekî dibe û li esîmanan difire. Çavên wî tijî qîrî bûûû, rûyê wî xemgîn bûûû..!! Ji nişkava, ez ketim metirsiyek mezin, weke ku tu li cihekî bilind bî û bikevî ez wisa bûm!!.. Di metirsiyeke mezin de me.. Nizanim ji bo çi..! Kesên li kolanê, bi dengê tiktika dilê min li ser serê min kom bûne.. Baranek mîna lêmiştê dibare, dengekî bilind li deriyê mal ket..!! Bavê min bû, ew weke birûskan hat mal.. Çavên wî tijî rondik bûn, dengê wî mîna birayê min, winda bûûû.. Mîna latekî bûûû.. Bavoooo..!! Tu çima wisa bûyî? Biaxive? Tenê bi gotinekê.. peyivîna xwe bi dawî kir.. Birayê te.. birayê te tuneye, winda bûyeeeee. Dayîka min dîîîn bû...zimanê min hate girêdan, hate lalkirin.. Ez di bin baranê de, bi kolanan ketim, nizanim çi bikimm... Ji wê rojê de, ta niha her tim li riya wî dinêrimmm.. Dê û bavê min bê hiş mane.. her gava ez li wan meyze dikim, agir bi dilê min dikeve. Her tim li riya birayê xwe meyze dikim û dibêjimm a niha wê bê mal..!!! Lê mixabin!! Çar pênç meh derbas bûn û ew nehat.. sed hezar car gazî xweda dikim, hêviya min tu carî qut nebûyeee. Birayê min dê vegere mal.. vegere hembêza dê û bavê xwe. Bi rastî êşekek kûûûr bû .. Rojeke bedbîn, xemgîn û bi şewat bû. Rojên min bi girî û şîn derbas dibûn.. Xwezî ew roj biçin û qet venegerin. Bi çend gotinan, ez ê ji dayîka xwe re bêjimmm.. Daaaayê..!! Qet rondikan ji çavên xwe mebarînee.. Birayê min ne windayee.. Birayê min mîna teyrê baz li ser welat digere û difiree.. Li Hawara Welêt çûûû..

# Pirtûka "Jiyana Min a Kurdî"... Nûridîn Zaza

**D.Cûmê**






Pirtûka "Jiyana Min a Kurdî", nemir Nûridîn Zaza bi zimanê firensî nivîsandiye û rêzdar Ronî Mihemed Dumilî wergerandiye zimanê erebî. Pirtûk ji 223 rûpelên ji Pîvana Iso/B5 pêk tê. Ji Mala Aras ya çap û weşanê- Hewlêr- 2001ê derçûye.

Dr. Zaza pirtûk li ser beşekî ji jiyana xwe nivîsandiye, ango tenê li ser kar û xebata xwe ya ji ber kurd û kurdiyetiyê ve kiriye bi bîr aniye, tiştên malbatî û kesayetî jî ne anîne zimên.

Wê li despêkê, rewşa bajarê Madenê ku lê hatiye cîhanê û rewaş tevahiya Bakurê Kurdistanê di salên dawiya dewleta Osmanî û ta despêka salên sihî ji sedsala bîstan ravekiriye. Dema ku Nûridîn deh salî bû, ew ji ber gefûgurên dewleta Tirk ji bira û malabata wî re, li gel birayê xwe mezin Dr. Nafiz derbas Sûryê dibin. Li despêkê li bajarê Helebê, paşê li bajarê Şamê rûdinin. Gava ku mezin dibe û dibe gêng, diçe welatê Swêsra, li wir xwendina xwe kuta dike û dîploma diktora di "zanînên civakî û perwerdyî" de werdigire. Li wê demê, Partiya Demokrat û Kurd li Sûryê ava bû bû û doza mafê gelê Kurd li Sûryê dikir. Da ku Dr.N.Zaza xebata xwe ji ber doza gelê Kurd ve berdewam bike, welatê Swêsra li şûna xwe dihêle, vedigere Sûryê, derbas nav rêzên partiyê dibe û di maweke kin de dibe sekretêrê komîta navendî. Piştî wê, bi sedema xebata wî a kurdeweriyê, Dr. Zaza bi salan tê girtin û dikeve zindanan; li Îraqê, Sûryê, Libnanê û Urdinê tê binçavkirin û êş û dijwariyên pir giran dibîne. Lê belê, gava ku deriyên xebata sivîl û siyasî lê têne girtin, ew neçar dibe ji Sûryê derkeve, berê xwe bide Ewrupa, li welatê Swêsra bi cih û mal bibe û jiyan û xebata xwe ta roja dawîn ji temenê xwe lê diborîne.

Bi rastî, mirovê nemir Dr. Nûridîn Zaza jiyaneke kurdî a pir bi ked, êş û bi xebateke pir mezin derbas kiriye. Erê salên wî yên xebatê li Sûryê pir ne dirêj bûn, lê belê piraniya wan salan bi veşartin, dûdayî û di zîndanan de derbas bûne. Wî bi xebata xwe ya pîroz di ber gelê xwe de, navê xwe bi avzêrê di dîroka gelê Kurd e nivîsandiye û xwe nemirî kiriye. Pir hêja ye ku mera pirtûka jinenîgariya Dr.Nûrdîn Zaza "Jiyana Min a Kurdî" bixwîne û taqe û serboriyan jê hilîne.

# Têgeha " Piragmatîk "?

Bêjeya ((piragmatîk)) di axaftin û alavanê ragihandinê de pir bi kar tê. Dibêjin, ev serok, partî yan ev siyast piragmatîk e. "Piragmetîk" çi ye?

"Piragmat" bêjeke Yûnanî ye bi wateya "kar û karikirin" ne. Ew ji bona nasandina rêbaz û bîrdozeke felsefî-siyasî bi kar tê. Li gora rêbaza piragmetîk, tenê serkeftina di karekî de rastiya nêrîn û rêbazan mêlag dike, ne bervajî wê. Siyastmedarê piragmetîk, li gora encamên ku texmîn dike dê ji karê xwe bibîne xebata xwe dike. Ango biryarên xwe ne li gora ramaneke ku berê heye, yan îdiyolociyeke siyasî ya taybet kar dike. Digel ku piragmatîkî xwe ji îdiyolcî û felsefan dûr dixin, dijîtiya hemî rêbazên tevahî dikin, nemaze jî rêbaza Marksîzmê. Lê di rastiyê de doza îdiyolocî û felsefeke serpeçînî dikin, ew jî li ser azadiyeke bêsînor radibe. Kesên piragmetîk, bawr nakin ku rijêmên dîmokrat ên mînak û sergihayî hene; ew ji bo pêkanîna armancên xwe rê didin ku her awakî siyasetê bi kar wînin, di nav de jî sîstema demokaratîk.

